# Efrîn di bin dagîrkeriyê de (294):

## Mala "Koçber Reşîd Hemo" hepis e, dijatiya temenmezinekê û zave û neviyê wê yê negîhayî, vêrgiyên "Usame Rehal", qutkirina darine zeytûnê û şewatin daristanan, pevçûnin di navbera çekdar û hêzine Turkî de, şerek di navêna milîseyan de















Ala her dewletekê di destûra wê de tê erêkirin û bi zagonê sîstem dibe, li ser hemî erdnîgarî û saziyên wê yên fermî tê hildan, û yê/ya dijatiyekê li ser bike tê cezakirin, lê eger alek -bê nixumandineke yasayî û bi zorê çekan- li ser axa dewleteke din were ferzkirin, wê hîngê hildana wê bi xwe dijatiyeke li ser serwerî û rûmeta wê dewletê, vêca tiştekî normal e ku gelê wî welatî nerazîbûna xwe bide nîşandan; Weke çawa Turkiyê ala xwe li ser beşekî ji Axa Sûriyê bi piranî û bê ku zagonek jê re hebe (nimûne: Zagona dagîrkeriyê)dide ferzkirin, û hîn dûrahiyeke Islametiyê jî didiyê, û bi behaneyeke  dîrokî ye Osmanî rê dide giştîkirina wê, û fermanin kuştinê yê ku destdirêjiyê li alê bike derdixe!

**Ev jî hin bûyînên li ser rewşên serwerkirî ne:**

**= Gundê "Hopka" û mala siyasetmedarê Koçkirî "Reşîd Hemo":**

Bi /2/KM li Rojavayê Bajaroka Reco dikeve, ji /27/malan pêk tê, li dema dijberiya hatiye ser herêmê li 20.01.2018an. Z nişteciyên wê yên resen hatin koçberkirin, û tenê jê heft malbat vegerîn, û /20/malbat ji anîndeyan têde hatin niştecîkirin, piştî ku Milîseyên "Lîwa'i El'şemal" (ên ku "**Ebo Ebidela El'zurbe**" yê ji Bajaroka El'zurbe - Gundewarê Heleb ê Başûr serkêşiya wan dike) desteseriya xwe li ser da ferzkirin, û dora/30/malbatî ji anîndeyan jî li çateriya gund di çadiran de rûdinin; Û wan milîseyan piraniya heyînên di malan de dizîn, dest danîn ser zeviyên zeytûn û tirî yên hemwelatiyên ne li wir an jî vêrgiyên bilind li ser hinan ji yên ji ber wan ve hiltînindatînin dan ferzkirin, û herweha jî dest danîn ser /20/malan tevî xwarinvexwarin û raxistok û amûrên têde,  ji nav wan mala Siyasetmedarê Kurd ê koçkirî "**Reşîd Hemo**" - yek ji damezrênerê partiya yekemîn a siyasî ya Kurdî li Sûriyê li sala 1957an. Z, û ji xwe re kirin **hepseke taybet**, di wexta ku ew mala berî dagîrkirina Turkiyê simbolek bû ji xebata siyasî û belavkirina zanist û zanyariyê re li herêmê li dirêjahiya dehsalan, û weha jî bi sedan pûtpêdanber û seredanvanan berê xwe didanê, û bûbû cihek ji vejandina boneyên niştîmanî re, nemaze jî ku herdu dilovanberan "Reşîd Hemo û hevjîna wî Xedîce" temenek têde derbas kirin û tirbên wan jî di hewşê de ne, bi ser de jî hebûna gora lawê wan ê mezin "Qedrîcan" tê de.

Ev çi "şoreşger in", û di bin perda "Hemahengiya Sûrî - Ixwanî" de, mala sivîlekî siyasî (li dijî nezanî û zulim û zorê û Rijîma "El'be'is" radiwestî, xebatkarekî di ber cefakêşan û demokrasiyê û Doza Kurdî ya dadmend di welêt de -bêtirî şêst salî- berevanî dikir, û kete hepsan û aliyên ewlekariya şopandina wî kirin û dane dû) dagîr dikin...ji dêvla ku malê bipên û simboliya wê biparêzin.

**= Dijatiyek li ser temenmezineke Kurd û nevî û zavayê wê:**

Li 23 06.2024an. Z, "**Ebo Umran**" - berpirsiyarê Rêbenda "Ehrar El'şerqiyê" dijatiya Hemwelatî "**Mihemed Mistefa kurê Elî**" ji xelkê Gundê "Cela" - Navça Reco (yê ku neçar bûye ku tevî hevjîna xwe bi awakî demkî li ba diya wê ya temenmezin "**Zêneb Şêxo Mistefa** /85/sal" li Gundê "Kûra" - Navça Reco rûne) kir û mekin lêxist, digel wê jî avêtina gef û sixêfan li dijî xelkê gund, û dema ku temenmezinê destêwerdan kir da ku dijatiyê rawestîne, ew rastî lêxistin û têvedanê hat, û ji ber wê ew di encama darivandineke mejiyî de bi seknexwînê ket - li gor raporeke bijîşkî, û bo Nexweşxana Reco hate şandin û paşê jî bo Bajarê Efrînê, û rewşa wê jî ne hêmin e.

Ew jî piştî ku "Ebo Umran" bi alîkariya "**Ebo Memdûh**, **Ebo Wedah**/xocê mizgeftê" (hersê jî ji Xota Şamê ne û li ba Milîseyên "Ceyş El'îslam" endam bûn) û "**Ela'i Merzûq**/Ebo Xalêd" (berpirsiyarê ewlehiyetê/emniyetê li ba Milîseyên "Ehrar El'şerqiyê") yên li Gundê "Kûra" rûniştine rabûn xortê negîhayî "**Ehmed Mihemed Mistefa** /14/sal" (neviyê temenmezinê û bi tenê vê re rûniştî û yê ku şîşak zêtê zeytûna weke zekat ji aliyê dapîra xwe ve ji "Ne'ime - hevjîna Ebo Umran" re biriye, û tewanbariyeke nesinciyane pêve hatiye zeliqandin) revandin, û herweha jî revandina merivê wî "**Firqan Mihemed Birîmo** /40/sal" ji xelkê G. "Kûra" bi behaneya ku wî li ser "Ne'ime" deng kiriye, û /2/hezar Dolar Emrîkî ji bo berdana wan ji her yekî xwestin, lê ew razî nebûn bidin ji ber ew bawerin ku ne sûcdar in, û ji ber wê ew radestî "Asayêşa Sivîl li Reco" hatin kirin, û bo Hepsa Maratê ya navendî li Efrîn bi tuhmeteke çêkirî hatin şandin.

Û piştî du rojan ji dijatiyê li ser temenmezinê û zavayê wê, "Ebo Umran" û "Ebo Memdûh" û "Ebo Wedah" rabûn mala Hemwelatî "**Mihemed Elî Xelfan** /43/sal" li Gundê "Kûra" basmîş kirin û êrişî ser kirin û gef bi kuştinê danê, bi behaneya ku ew bi nerindî li ser hevjîna "Ebo Umran" dipeyive. Û wan "Xelfan" revand û xistin ewliyeta/emniyeta "Ehrar El'şerqiyê li Reco", û vêrgiya du hezar Dolar Emrîkî xwestin da ku berdin, û ta niha li ba wan bendkirî ye.

Were bîranîn jî ku hin hemwelatiyên gund li dema dijatiyê li ser temenmezinê û zavayê wê, ji bo destêwerdanê bi ewlehiyeta Milîseyên "Ehrar El'şerqiyê li Reco" (yên ku G. "Kûra" desteser dikin) û Milîseyên "Asayêşa Sivîl li Reco" re têkildarî kirin, lê bê sûd bû; Û dema ku Hemwelatî "Henîf Birîmo - endamê Encûmena Xwecihî" (yê ku ji bo dermankirinê temenmezina birîndar biriye nexweşxanê) li ser wê yekê lome ji wan kirine, "Asayêşa Sivîl" çend katan ew girt.

**= Vêrgiyên "Ûsame Rehal":**

"**Ûsame Rehal/Ebo Hesen Obame**" (yê ji Gundê "Me'lelî" li Çiyayê El'zawiyê - Idlibê û cîgirê "Ebid El'kerîm Cemal Qesûm" - serkêşê Milîseyên "El'lîwa'i 112"), li 01.07.2024an. Z, endamek şand ba Hemwelatî "**Arêf Ehmed Dehdo** /63/sal" li Bajaroka "Be'idîna" - Navça Reco, û /50/Dolar Emrîkî weke vêrgî jê xwest, li ser makîna ku ji çend rojan ve kiriye, bi behaneya pirojeya çaksazkirina rêkan, û dema ku ew razî nebû bide, ew bi Biryargeha "El'lîwa'i" hate vexwendin û çend katan hate rêbendkirin, ta ku herdu birayên wî neçar bûn ku ji bo berdana wî /300/ Dolar Emrîkî bidin.

Li vê dawiyê rabû riyên ziftê li Bajarokê û Gundê "Dumiliya" yê hevcîwar çaksaz kirin, û bi taybetî jî riya şaxeyî ya ku dere guvêşgeheke zeytûna (ye ku wî di avahiyeke kevin e desteserkirî û ye koçberê zorane "**Hebeş Hebeş Betal** - ji xelkê G. "Dumiliya" de çêkiriye), û li ser hesabê Malbatên Kurd tenê, bê malbatên anîndeyan ji Ereb û Turkmana yên xwedî makîne û alet bi çend caran ji yên Kurdan pirtir, û herweha xwediyên (satsyonên sûtemeniyê, nanpêjgehek/firneyek otomatîk, nivîsgehên guhertina peran, dîkan...HWD) ên vêrgî û bace jê nayêne girtin; Wî /50/Dolar Emrîkî vêrgî li ser her malbeteke Kurd xwedî aliyetekê û /500/Dolar jî li ser xwediyê her guvêşgeheke zeytûna da ferzkirin, û di encamê de dora/16/hezar Dolar Emrîkî ji "Be'idîna" û dora /8/ hezar Dolar Emrîkî jî ji "Dumiliya" wergirt.

Û ji berî heyvekê, dijatiya xortekî di dîkana wî ya berberiyê de ya li Bajaroka "Be'idîna" kir û mekin lêxist, û vê re jî çar xortên din çend rojan di biryargeha "El'lîwa'i" de û di bin lêdan û kêmrûmetkirinê de bend kirin, bi behaneya ku ew vexwardinên îspirtoyî vedixwin, di heman dema ku endamên wê aşkere û vê lêpirsîn vedixwin.

Were bîranîn jî ku "Rehal" ji sala 2018an. Z be bi zorê çekan bi xwe dest daniye ser gelek malmewdanên Kurdan, jê: (mal û dîkanên "Dilovanber **Mistefa Neş'et Mistefa**" da ku malbata xwe tê de bide rûnişkandin, stasyona sûtemeniyê ya "**Reşîd Hesen Dehdo**" bi ser ku ew li wire jî, avahiya guvêşgeha zeytûna ya "**Xesan Umer Fewzî Dehdo**" bi ser ku ew jî li wir e, avahiya tîmargeha mirîşkan a "Dilovanber **Mistefa Ebdo Ce'ifer**" bi ser ku du zaroyên wî li wir in) li Bajaroka "Be'idîna"; Û herweha jî li ser dora/7/hezar darî zeytûnê yên xelkên Gundên "Xaziyana, Şîtka, Hebo" - Navça Mabeta, û bi ser de jî ew hemwelatiyên gundên di bin desteseriya "El'lîwa'i" de -tevî acet û aletên wan bê kirê di xizmetguzariya zeviyên desteserkirî de bi kar tîne, û keriyên wî yê pêz jî hene; Û yê veşartî û em pê nizanin pirtirî vê ye.

**= Qutkirina darên zeytûnê:**

Bi ser ku niha hewcedarî ji bo germkirinê bi êzingan tune ye, û darên zeytûnê girtî ne, û ew ji xwediyan re jêdera jiyankirinê ya bingehîn e, li Başûrê Gundê "**Hebo**" - Navça Mabeta giropeke çekdar /10/darên mezin ên Hemwelatî "Remzî Reşîd Egît" ji xelkê gund ji kokê ve qutkirin.

**= Şewatên daristanan:**

Di şopandina nûçeyên "Berevaniya Sivîl a Sûrî" de girseya şewatên ku daristanan li Herêma Efrînê daduqultînin/daduqurtînin tê xuyakirin, ewê ku me pircaran tekez kiriye ku pêxistina wan bi awakî mebestkirî û ji ber gelek sedeman e, û di vê çarçewê de "Berevaniya Sivîl" li 01.07.2024an. Z vemirandina sê agiran li hirşên Gundewarê Efrînê "**Mabeta, Meydanekbezê, Be'idîna**" tekez kir, û herweha jî vemirandina şewatina li daristana Gundê "**Hechesna**" - Navça Cindirêsê (yên ku li Roja Pêncşemê 04.07.2024an. Z hatine nûkirin û ta niha jî berdewam in), û berê jî li herdu rojên 27-28/06/2024an. Z şewatin hebûn. Û em ji wêneyên belavkirî girseya ziyanan û herweha jî kokên darên berê ji aliyê milîseyan ve ji bo êzingkirin û bazirganiyê qutkirî dibînin.

Û ji aliyekî din ve, û li gor jêdereke xwecihî, li Êvara Çarşemê 03.07.2024an. Z, şewatên daristana Çiyayê "**Hawarê**" - N. Reco li çend xalan hatin nûkirin, û berê jî di navbera 03-06.06.2024. Z û di 15.06.2024. Z de şewatin mezin li wir hebûn.

**= Xwepêşandan û pevçûnin:**

Weke nerazîbûn ji daxuyanên "Hakan Fîdan" - wezîrê derve yê Turkiyê û serokê wê "Erdoxan" re, yên li ser lihevhatinê bi Rijîma Sûriyê re, vekirina Derbasgeha "Ebo El'zindên" li Bajarê "Babê", û herweha jî êrişa Turkina li ser koçberine Sûrî li Bajarê "Qeyserî" (weke nimûne), li destpêka vê Tîrmehê kombûnine nerazîbûnê ji çekdar û sivîline anîndekirî li Bajarê Efrînê û Navendên Cindirêsê û Reco derketin, dirûşim û siloganin li dijî Turkiyê avêtin, û xwepêşanderan Ala Turkiyê ji gelek cî û rêbendin serekîn danîn; Ta rewş pêş ve çû û gihîşte avêtina qurşînan di navbera payavanên(leşkerin Turk û endamin ji Milîseyên Asayêşa Sivîl) avahiya "Sera Kevin" - biryargeha Waliyê Turkiyê û karmendên wî, û girseyên nerazîberan de, û tangeke Turkî bi rişêşa giran ew armanc kirin, û di encamê de bêtirî /10/ an ji wan hatin kuştin û bi dehan jî birîndar bûn, û vê re jî ziyanin mezin gihîştin malmewdanên sivîlan, ji malan û dîkanan û makînan.

Û li rojên dû wê re, Milîseya "Asayêşa Leşkerî li Efrînê" (ya ku Istîxbaratên Turkiyê damezrandiye û yekser serpereştiya wê dikin) bi pişikdariya hêza hevbeş a "Firqit El'hemze, Firqit El'sultan Silêman Şah - El'emşat" (yên bêtir bi ser Turkiyê ve), desteserkirina xwe li ser bajêr û navçên wê pihêt kirin, û hersê aliyan dest bi dûdan û girtina xwepêşanderan kirin, ji nû ve Ala Turkiyê li hemî cihan hate hildan, û hişyariyine hişk ji her kesê ku nêzîkê bibe re hatin avêtin; Û "Hêza Hevbeş" herçû bû xwedî bandoreke mezintir, û karwaneke çekdarane ji Milîseya "Tîpa/El'firqe 77" a bi ser "Desteya Tehrîr El'şam" ve derbasî Bajarê Cindirêsê bû, bi hevrêziya "Hêza Hevbeş" (ya ku berê têkildariyeke wê ye baş bi Desteyê re heye), ji bo "kontolkirina rewşê li bajêr" - li gor gotina wê.

**= Geregoşî û serberdayetî:**

**-** Li 30.06.2024an. Z, tevlihevî û gizgizî kete rewşa ewlehiyê li Gundê "**Metîna**" - Navça Şera, bi sedema nakokiyeyekê di navbera Milîseyên "Firqit El'sultan Mûrad" û hin anîndeyên Bajarê "Restenê" - Humsê de, piştî ku endamên rêbenda "Mûrad" li çateriya gund mekin li mêrekî û zaroyê wî ji wê giropê xistin, ji ber ku wan simaq ji erdekî ji aliyê "Firqê" ve desteserkirî dizîbûn, û di dû re merivên wan jî hêzeke çekdar ji anîndeyên "El'resten" anîndindan û daxwaza cezakirina endamên rêbendê kirin.

**-** Li 30.06.2024an. Z, li **Herêma Pêşesaziyê** li Bajarê Efrînê, di navbera Milîseyên "Tevgera Ehrar El'şam" û çekdarin Bajaroka "Heyanê - Gundewarê Heleb a Bakur" de pevçûnin çêbûn, û di encamê de pênc kes û endamek rengereng birîndar bûn û ziyan gihîşte makînak Milîseya "Asayêşa Leşkerî" û makîneyin sivîlan, û her çû çarçewa gizgiziyê fere bû; Û ew jî bi sedema dijatiya hejmarek ji "Ehrar El'şam" li ser Hemwelatî "Ehmed" ji xelkê Efrînê di dîkana wî ya çaksazkirina elektirîka makînan de, bi behaneya derxistina dengên mekin, û paşê jî destêwerdana mêrên "Heyanê" di kêşeyê de.

**Tiştekî xwezayî ye ku al -weke simbola dewletê- ji aliyê hemwelatiyê wê û yên din ve jî were rêzgirtin ger di ciyê wê yê lêhatî û xwezayî de hildayî be, lê wê pîs were danûsitandin dema ku bi nîşandayînên xwe dijatiyê li ser gelin din bike, û nandoz tucarî nikanin nirx û simbolên tu dewletê biparêzin, û dibe di çi**

**kêlîkê de li hemberê jî rabin ger nandoziya wan were fitlandin; Vêca divê Artêşa Turkiyê ji Sûriyê vekişê sînora xwe ya navdewletî, da ku Ala Turkiyê neyê redkirin û pîskirin.**

06.07.2024. Z – 2636. K

**Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn**

**Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

--------------------------

**Wêne:**

**-** Siyasetmedarê Kurd ê koçkirî "Reşîd Hemo" li pêş mala wî li G. "Hopka" - N. Reco, û hersê gorên di hewşa malê de.

**-** "Ebo Ebdela El'zurbe" - serkêşê Milîseyên "Lîwa'i El'şemal".

**-** "Ebo Umran, Ela'i El'merzûq, Ebo Memdûh" ên dijatiya temenmezina Kurd "Zêneb Şêxo Mistefa" û zava û neviyê wê li G. "Kûra" - N. Reco kirine.

**-** "Usame Rehal" - cîgirê serkêşê Milîseyên "EL'lîwa'i 112" li Bajaroka "Be'idîna", 27.10.2018. Z.

**-** Şewatin di daristaneke G. "Hechesna" de - N. Cindirêsê.

**-** Pevçûnin li pêş avahiya Sera Kevin - biryargeha Waliyê Turkiyê li Bajarê Efrînê.

**-** Karwanek Milîseyên "Tîpa/Firqeya 77" dikeve Bajarê Cindirêsê.